

**Cîroka Kurmancî:****MIH Û ŞÊR Û GUR**

Çarekê êleke Koçeran bar kir. Mihek li şûn waran ma. Mihê jî rê girt û çû, rastî mêrgekê hat; mêrgeke pir xweş. Mihê jî tê de warê xwe çêkir û za; du berxên mê anîn.

Rojekê mihê dît vaye şerek bi ser de hat. Şêr jê re got: Tu çima li vir î?

Mihê got: Bi saya serê te , ko tu siltanê heywana yî, ez û berxikên xwe li vir, di vê mêrgê de diçêrin.

Şêr got: Qet tu hesaba meke, ez li piştta te me, û şêr çû; mih jî ma.

Rojekê mihê dît vaye gurek hat. Gur jê re got: Ma tu nizanî, ku ev mêrg a min e, û tu bêyî min hatiye û tê de diçêrî.

Mihê got: Ev mêrg, mêrga şêr e.

Gur got, na ev mêrga min e û ezê herdu berxên te bixwim, ji dêla çêriya xwe ve. Û rabû herdu berx xwarin û dîsa gote mihê: Careke din ez vegerim û te li vir bibînim, ezê te jî bixwim.

Gur da rê û çû. Şêr hat. Mihê hal û hewalê xwe jê re gotin. Şêr got: Meyzê, ezê xwe di piş vî kevirê ha de veşêrim. Gava ku gur hat û gote te ev mêrga min e, tu bêje na ev mêrga şêr e. Heke got na mêrga min e; tu bêje hema sê gavan ber bi vî kevirê ha ve bavêje û bêje vî kevirî ev mêrga min e, min qebûl kir.

Rabû şêr xwe di piş kêvir de veşart. Gur hat û gote mihê, hêj tu li vir î?. Ma min ji te re negot ji vir here. Mihê got, ev mêrga şêr e; wî got na. Axir mihê got, ji min re bi vî kevirî ha sînd bixwe min qebûl kir.

Gur jî li tiştêkî wilo binêkar bû. Hema ber bi kêvir çû û got, ev gavek û du gav û sê gav. Li gava sisiyan çavê wî bi çavên şêr ketin, destê xwe avête pêsîra xwe û got: Bavo ez bextê xwe xera nakim , ev mêrga şêr e.

Çaxê wilo got, şêr ji pêl ve rabû û ber pê hat û jê re got: Belê guro ev bû mêrga min; ji ber ko te ez li piş kêvir dîtim. Lê te gava berxik xwarin, ev ne mêrga min bû!. Şêr hema lepek li qafê gur da û gur di cih de kuşt.

Çîroka me çû deştê, dê û bavên me çûn bihuştê.

**Kovara RONAHÎ- sal 1, hejmar 8, Şam 1942**

\*\*\*\*\*

**Dumahîk : Di bîranîna....**

Wê hîngê, ango ji beriya 53 salan, kesên ku ji nav Kurdên Sûriyê Bekeloriya (Lîse) wergirtibûn li ser tiliyan dihatin hejmartin, çî li Kurdxê, Kobaniyê û Cizîrê , bi serde jî , xizanî û nezaniya piraniya gel gelemper bû. Û li hêla dî jî, heyam û siyaseta dewletê di derbareyî çalakî û tevgerê kurdî weha de, dijwar, bihinteng û çavsor bû .Nemaze, doz û daxwazên ev partiya Kurd a demokrat di nav Kurdan de, ciyê tirs û nerazîbûna gelek hêzan bû.

Li beramber hemî reng û cûreyên setemkarî û kedxweriyê , li beramber pişaftina hebûna Kurd , şoventî, paşverûtî, nijadperestî û binpêkirina mafên mirovan, partiya Kurd dengê xwe bilind dikir, bi her hawî li zimanê dê dibû xwedî, û bi rêbazeke aştiyane, bi dil û can hewildida ku bi raya giştî bide zanîn, ku li Sûriyê jî pirseka Kurd a dadmend û mafdar heye, Kurd û Ereb ne dijminên hev in, dostanî û biratiya gelan her û her û li hemî deman divêt cîgehê parastin û rêzgirtina hemiyan be.

Rêz û silav ji wan hemî xebatkarên dilsoz re, yên ku jiyana xwe terxî mirovatîyê kiribûn û doza gelê xwe- doza **Aştî , Azadî û Wekhevîyê-** dabûne pêş .

**Sînorê Yekta**